Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî  Jimar :1007  23-Cotmeh- 2022  www.ronahi.net/ku/



Navnîşan
www.ronahi.net/ku/  nameronahi@gmail.com  ☎ 423165


## Welatiyên Serê Kaniyê: Berxwedan planên qirêj têk dibe

**Dilîn Ehmed-Qamişlo**

**Welatiyên bajarê Sarê Kaniyê diyar kirin ku, li hember êriş û dagîrkirina dewleta tirk, yekîtî û têkoşîn pêwîst e. Herwiha welatiyan got, sê sal ser dagîrkirina mal, milk û bajarê me derbas dibe, em jî ji bo rizgarkirina bajarê xwe li kampan li ber serm û germê, li ber xwe didin.**



9`ê Cotmeha 2019, dewleta tirk ya dagîrker û çeteyên wê bi tang û tobên herî gira, bi balafiran êrişî bajarê Serê Kaniyê û Girê Spî kir. Çeteyan di êrişên xwe yên hov de, hemwalatî bi zarok û pîr ve kirin hedef û komkujî pêk anîn. Ev jî bû sedem ku pêkhateyên her du bajaran neçar bimînin koçberî



herêmên ewle bibin.
Li ser armanca dewleta tirk ji êriş û dagîkirinê, welatiyê bi navê Ebdilhemêd Hemê ku endamê Ofîsa Xizmetê ya Kampa Waşokî de cih digire û welatiyê bi navê Ebdil Ezîz Îsa, ji rojnameya me re axivîn.

**`Xwediyî xakê koçber dike, biyaniyan bi cî dike`**

Endamê Ofîsa Xizmetê ya Kampa Waşokanî Ebdilhemîd Hemê dibêje: "Em li malên xwe bûm, me êrişî ti kesî planên dewleta tirk û çeteyên wê, ya herî girîng û pêwîst yekîtî ye. Ebdilhemîd axaftina xwe wiha domand: "Dewleta tirk çeteyan ji bo ku dagîrkeriya xwe pêk bîne bi kar têne û wan bi çek dike. Dewleta tirk çeteyan bi pere û dermanên hişbirê dixapîne, wan ji xwe re mîna kaxezê bi kar tîne. Ji bo têkçûna van planan ya herî girîng ewe ku, partî û siyasetmedarên herêmê, bibin yek, ta ku herêmîn me yên dagîrkirî rizgar bibin û welatê me azad bibe."

**`Dûrketina ji bajêrê xwe mirin e`**

Welatiyê ji bajarê Serê Kaniyê Ebdil Ezîz Îsa jî, wiha axivî: "9`ê Cotmeha 2019'an ji bo me bûye rojeke reş. Dûrketina ji xaka mirov pir zor e. Kiryarên ku dewleta tirk di derheqê me de dike, dervî zagonên dewletên navneteweyî ne. Mîna bi karanîna çekên Kîmyawî ku di êrişên xwe yên ser bajarê Sarê Kaniyê û Girê Spî, bi kar anîn."
Ebdil Ezêz Îsa got, bi saya alîkariya Rêveberiya Xweser, em li cihekî bi ewle bi cî bûne. Raste jiyana kampan zivistana ji ber sermayê pir zehmete û havînan jî pir germe, lê di xaniyên kirêde mayîn hê zehmettir e.



nekiriye. Dewleta tirk ya dagîrker bi tang, top ûbalafiran bi êrişekî hov, bajarê me dagîr kir. Em jî mîna tevayiyan xelkê koçber bûyî, destpêkê li bajarê Hesekê bi cî bûn. Piştî Rêveberiya Xweser Kampa Waşokanî ava kir, min malbata xwe ya ji 13 kesan pêk tê, li kampê bi cî kir. Armanca dewleta tirk ji êriş û dagîrkirinê diyare ku ew dixwaze demografiya herêmê biguherîne. Lewra bi êrişan, xwediyê erd koçber dike û biyaniyan li şûna wan bi cî dike."
Hemê diyar kir ku, ji bo têkbirina

Herwiha Ezîz got, keçekê min ya 7 salî nexweşe û eger em dervî kampê bana, ango li bajêr di malên kirêde ban, wê xwedîkirin û dermankirina keça min pir zehmet bûye. Lewra niha bi alkariya rêveberiya kampê û rêxistinê ku lê bi cî bûne, tê derman kirin.
Ebdil Ezîz Îsa axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Em ji hêza xwe bawerin ku wê bi berxwedana xwe, bajarên me ji dewleta tirk ya dagîrker û çeteyên wê rizgar bike. Emê jî heta dawiyê piştgiriya hêzên xwe bikin."

## Festîvala Çand û Hunerê ya Şengalê destpê kir

**Bi hilhatina rojê re li ser çiyayê Çilmêra yê Şengalê 1. Festîvala Çand û Hunerê ya Şengalê bi dûayên olî despê kir. Êzidiyan bi derketina rojê re bi gotinên ji dûaya sibehê peymana xwe ya aştiyê dan. Di serî de ji tevahiya gelan re û paşê jî ji civaka Êzidî re dûa kirin û gotin;"Ya siwarê rojhilatê û rojavayê, tu bidî xatira Dot û dayê, me Xilas bikî ji qedayê, beldayê û ji xelayê."**



Li ser çiyayê Şengalê li ser çanda kevnar a Êzdiyan 1. Festîvala Çand û Hunerê ya Şengalê bi dirûşmeya, "Li hemberî Fermana Çanda xwe biparêze" destpê kir. Ji ber ku Civaka Êzidî ji dîrokê û heta niha di aliyê olî de û him jî di aliyê çandî de yek ji xalên esas dûa kirine, festîvalê bi hilhatina rojê re li ser Çiyayê Çilmêre ku yek ji cihên herî bilinde bi dengê def û Şebêba, dûaya sibehê bi derketina rojê re destpê kir. Ciwan, oldar û dengêbêjên Şengalê di serê sibehê de li ber Quba Çilmêra lihev kom bûn û dest bi dûayên xwe kirin.
Di dûaya sibehê de Êzidî di serî de ji tevahiya gelan û piştre jî ji xwe re hêviya aştî û aramiyê dikin.
Piştî dûaya sibehê dengbêjên Şengalê lihev kombûn û dest bi gotina beytên olî kirin.
Piştî ku stran bidawî bû, berê xwe dana navenda Çand û Hunerê ya Şengalê ya li Serdeştê û li vir ji bo mêhvana xwarina sibehê ku ji xwarinên Şengalê pêk tê hate amadekirin û bi hevre xwarin.
Wê îro di saetên êvarê de li Xanesorê Belgefîlama Hêza bê pêşandan û roja yekemîn a Festîvalê bidawî dibe. Roja duyemeîn û sêyemîn bi bernameyên dewlemend li Geliyê Kersê dewam bike.- **ROJNEWS**

Sudoku:Pirs 17

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 5 | 1 | | | 7 | 3 | | 4 | |
| | | | 1 | | | 2 | | |
| 7 | | | | | 9 | | 5 | |
| | 6 | | 5 | 8 | 4 | 1 | | |
| | | | | | | | | |
| | | 7 | 3 | 6 | 2 | | 8 | |
| | 5 | | 6 | | | | | 8 |
| | | 4 | | | 8 | | | |
| | 7 | | 2 | 9 | | | 3 | 6 |

Sudoku: Bersiv 16

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 2 | 1 | 6 | 3 | 4 | 8 | 9 | 5 | 7 |
| 5 | 4 | 8 | 7 | 9 | 6 | 2 | 1 | 3 |
| 3 | 7 | 9 | 5 | 2 | 1 | 6 | 4 | 8 |
| 7 | 9 | 5 | 2 | 6 | 4 | 8 | 3 | 1 |
| 6 | 8 | 1 | 9 | 3 | 7 | 5 | 2 | 4 |
| 4 | 2 | 3 | 8 | 1 | 5 | 7 | 9 | 6 |
| 1 | 6 | 2 | 4 | 8 | 9 | 3 | 7 | 5 |
| 9 | 5 | 4 | 6 | 7 | 3 | 1 | 8 | 2 |
| 8 | 3 | 7 | 1 | 5 | 2 | 4 | 6 | 9 |

Quncika têgînan

| Bandor | Te´sîr |
|---|---|
| Gengaz | Mûhtemel |
| Girîng | Mûhim |
| Pankart (Fransî) | Di civîn û xwepêşandanan de, karton yan jî cawê gotinên kurt li gorî armancê li ser hatîn nivîsîn: *Di çalakiyê de parkata "Bimire Dagîrkerî" hat vekirin.* |
| Çalak | Kesê her tim di nava liv û tevgerê de. Jîr, jêhatî, zindî: *Mirovekî çalak e* |
| Pêvajo | Ji bo demeke diyar: *Di pêvajoya şerê cîhanê de xela çêbû.* |
| Pêwendî | Têkilî |
| Plan (Fransî) | Ji bo pêkanîna karekî yan berhemekî çêkirina rê û rêbazên wê: Plana xaniyê me hatiye çêkirin. *Ji bo êrişa ser dijberê xwe plan çêkirin.* |
| Proje (Fransî) | Di gelak qadan de planeke zanistî ye ku berê hatiye amadekirin, lêçûna wê hatiye hesabkirin, dem jê re hatiye veqetandin û ji aliye rêveberiyê ve hatiye qebûlkirin: *Projeya ava bajêr dest pê kir.* |
| Protesto (Îtalî) | Dijberiya li hemberî, biryar yan jî kiryarekê: *Kurdan Peymana Lozanê protesto kir.* |

## Karasû: PDK`ê sûcên dagirkeriya Tirkiyê dinixumîne

Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Mûstafa Karasû bang li gelê Kurd kir ku li hemberî êrîşên kîmyewî rabin û got, şerma herî mezin a dîrokî ye ji bo PDK'ê ku bikaranîna gazên bi jehrî û çekên kîmyewî dinixumîne. *R-3*




Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî  Jimar :1007  23-Cotmeh- 2022  www.ronahi.net/ku/


# PDK'Ê DEST DANÎ SER MASKEYAN, DEWLETA TIRK KÎMYA BARAND




## `Kesê bêdeng dimîne, şirîkê kuştina zarokên me ye`


Şêniyên bajarê Qamişlo sûcên dewleta tirkî ya dagîrker yên li herêmên parastina rewa şermezar kirin û bang li Civaka Navneteweyî û Rêxistinên Mafên Mirovan kirin ku nebin hevkarên kuştina zarokên wan û dagîrkirina axa wan in. ***R-4***

## Dayika şehîd: PDK'e berpirsê şehadeta keça min e




Emîne Abdullah a dayika şehîd Delal Şoreş ku ji bajarê Silêmaniyê ye got, eger PDK'ê dest nedanîba ser maskeyên gerîla, keça min şehîd nedibû. ***R-2***

## `PDK berpirsê yekê yê êrişên kîmyawî yên ser qadên gerîla ye`



Emîn Elîko diyar kir ku hêzên navneteweyî, hikumeta Iraqê û PDK`ê berpirsên êrişên kîmyawî ne û wê hisab ji wan bê xwestin. Herwiha bang li mirovên azadîxwaz kir ku li hemberî sûcên dijmirovî bêdeng nemînin. ***R-5***

## Aloziya Xazê berdewame û hê çareserî jî nehatiye dîtin




Aloziya Xazê hê berdewame û rojane welatî zehmetiyan di peydekirina xazê de dikşînin. Li milekî din jî bihayê Cereyê Xazê bilind bûye. ***R-6***

## HPG: 5 dagîrker hatin cezakirin




Farûk Sakik
**Parastina Gerîla** *R-4*


Ahmed Aktaş
**"Civîna Aliman" Li Amedê** *R-5*


Hafiz Ahmet Turhalli
**BÊ EXLAQ ME BI JEHRÊ DIKUJIN** *R-6*


# Dayika şehîd: PDK'e berpirsê şehadeta keça min e

Emîne Abdullah a dayika şehîd Delal Şoreş ku ji bajarê Silêmaniyê ye got, eger PDK'ê dest nedanîba ser maskeyên gerîla, keça min şehîd nedibû.

Navenda Nûçeyan-Qamişlo

Emîne Abdullah a dayika Şehîd Delal Şoreş (Peyam Abdullah) ku li Zapê di encama çekên kimyewî de şehîd bû, diyar kir ku desthilata Herêma Kurdistanê û dewleta Tirk bi hev re dijminên Kurdan e û got:"Eger ew maskeyên PDK'ê desteser kirin bigihîştina gerîla, keça min şehîd nedibû." Hirwiha got, keça min rêya tekoşîna azadiya gelê xwe hilbijart. Ez bi vê biryara wê sefirazim. Erdogan dijminê kurdan e. Lê, hikûmeta Herêma Kurdistanê jî, li gel Erdogan yek dest e û tu ferqa wan nîn e. Ew bûye şirîkê dijminê gelê xwe."



Hejayî bîranînê ye ku, dewleta tirk ya faşîst, di 14'ê meha Nîsana 2022'an li dijî herêma parastina Medya (Avaşîn, Zap, Metîna) şerê dagîrkirinê û qirkirinê dest pê kir. Dewleta tirk ji bo vî şerî, hemû teknîk hêza xwe û ya NATO'yê xist dewrê. Lê, li hember taktîk û tekoşîna gerîlayên Kurdistanê nekarî yek pêngavî pêşve biçe û êdî nedizanî ka hejmara windahiyên leşkerên xwe çawa veşêre. Ji bo cihên gerîla eşkere bike û bi rehetî bikeve her deverên çiyayên başurê Kurdistanê û ciwanên fedayiyên welat û gelê kurd bi şêwazê herî dijmirovî qir bike, alikarî ji PDK'ê xwast û PDK'ê jî rûpelê diroka xwe ya xiyanetê carke din vekir û bê ku şerim bike dest bi kiryarên xwe yên ku qet jê nexerîbe (xiyaneta gelê xwe) kir.

PDK'ê di despêka vî şerî de dest danî ser hezar û 200 maskeyên li dijî gaza kîmyawî yên ji bo gerîla diçû. Bi vê kiryara xwe ya rûreşiyê xwe xist bin çengê dijminê gelê xwe û bê ku ji xwe şerim bike, ev yek bi serbilindî bi rawa giştî re parve kir. Ev kiyara PDK'ê ya li dijî gel û tekoşîna azadiya kurd ne ya despêkê bû, ne jî bû ya dawî. PDK'ê bû rênîşana dewleta tirk ya cihên gerîla yên li çiyayên başurê Kurdistanê. Wê cihên gerîlan nişanî dagîrkeran da, dagîrkeran li ser gerîlan çekên kîmya baran.

Herî dawî 18'ê vê mehê HPG'ê nasnameya 17 hevalên wan yên di êrişên kîmyawî şehît ketîne, di daxuyaniyekê de eşkere kir. Herwiha dîmenên şehît Delal û Baz yên beriya ku şehît bikevin bi raya giştî re parve kir. Vî dîmenî ji bo hemû cîhanê eşkere kir ku dewleta tirk ya faşîst bi alîkariya PDK'ê, li dijî gerîlayên azadiyê bi çekên kîmyawî şer dike. Gelê hemû li dijî vî şerê qirêj hers bûye û li her cîhê cîhanê nerazîbînên xwe bi daketina kolanan diyar dike û malbatên şehîdan jî dibêjin: 'Em dizanin ku dewleta tirk faşîste û dixwaze gelê kurd qir bike. Lê PDK'e çi ji zarokên me dixwaze, çima destê PDK di nava xwîna zarokên me de ye? ewê çawa hesab bide me, ewê çawa hesab bide dîrokê!..'

# Kar û Xebatên Navenda Keşifkirina Penceşêra Sîngê

Dilîn Ehmed-Qamişlo

**Tendirustiya Cîhanê meha Cotmehê (Heyva gulan) wek meha hişyarkirina civakê bi taybetî jinan ya li ser Penceşêra Sîngê destnîşan kiriye. Divê mehê de kar û xebatên navendên keşfkirina nexweşiya Penceşêra Sîngê, zêde dibe.**

Nexweşîya penceşêrê ne tenê bandorê li laşê mirov dike, herwiha bandora wê ya manewî, derûnî û madî jî heye. Lewra mirov dibîne ku yê bi nexweşiya penceşêrê, di qunaxa dermankirinê de, roj bi roj bi zehmetiyên herî dijwar rûb rû dimînin. Gelek cureyên penceşêrê hene, lê ya herî zêde li ser asta cîhanî û herêmî Penceşêra Sîngê ye.

Meha Cotmehê ku wek meha Gulan tê pênasekirin, kar û xebatên navendên keşifkirina Penceşêra Sîngê, zêdetir dibe. Lewra navend dest bi kampanya ya bangewaziya jinan dike ku serdana navendê bikin û keşfa Penceşêra Singê, çêkin.

Li ser mijarê rêvebira nexweşxaneya Heyva Sor ya Kurdî ya bajarê Qamişlo û ya Navenda Mamografya Şêrîn Elî ji rojnameya me re axivîn.




Rêvebira nexweşxaneya Heyva Sor ya Kurdî û Navenda Mamografya Şêrîn Elî di hevdîtinê de li ser Penceşêra Sîngê dest bi axaftina xwe kir û got: "Penceşêra Sîngê nexweşiya herî zêde ku di nav jinan de belav dibe ye, herwiha ev cura penceşêr ya herî xeter e."

**`Jimara serdanan zêde dibe`**

Di destpêka vekirina navendê ku beriya sê salan hatiye vekirina, jimara jinan yên ku serdan dikirin kêm bûn. Lê îro beşdariya jinan ji bo serdana navendê gelek zêde bûye. Li ser vê yekê jî Şêrîn jimara kesê ku serdan kirin, diyar kir û wiha got; "Navendê ji dema vekirina xwe ve heta roja îro 4 hezar û 28 nexweş pêşwazî kiriye, ev nexweşî ji 91 kesan de hatiye tespîtkirin û ji van jî nexweşekê me tine mêr bû, yên din hemû jin bûn. Çimkê piraniya kesê ku bi vê nexweşiyê dikevin, jin in."

**`Peneşêra Sîngê piraniya wê wîraset e`**

Herwiha li ser sedemên vê nexweşiyê Şêrîn Elî wiha axivî: "Ti sedemeke diyar nîne, lê piraniya mirovê ku bi vê nexweşiyê dikevin, sedema wê wîraset e. Lewra ji 91 kesê ku bi vê nexweşiyê ketine, 84 ji wan wîraset bû.

Şêrîn anî ziman ku jimara jinên serdana navendê dikin her ku diçe zêde dibe û wiha got: "Piştî dayîna semêner û perwerdeyên tenduristiyê ji bo hemû herêman, serdana jinan zêde dibe. Lewra êdî jin hişyar bûye ku derengbûna pêhesandina vê nexweşiyê, dermankirina wê zehmetir dibe."

Li ser kampanyayên ku navend li dar dixe û zêdekirina wê di meha Cotmehê de, Şêrîn axaftina xwe wiha domand: "Navenda me ji bilî xizmetên tenduristiyê, desteka manewî û derûnî jî dide nexweşan. Bi armanca hişyarkirina civakê û bi taybetî jin, ji aliyê bijîşkên pispor ve li navenda me herwiha li tevayîya saziyan, em di meha Cotmehê de semînerên hişyariyê, tê li dar xistin. Lewra her çiqas jin




zû kontrola xwe bike, netirsin û derûniya xwe xerab nekin, ewqasî dikarin bi rehetî ji nexweşiyê rizgar bibe."

**`Tendirustiya mirov ji her tiştî girîngtir e`**

Şêrîn da zanîn ku wan di vê mehê de pêngavekê 4 rojan li dar xist û tê de saetên karên xwe zêdekirin. Navend ji saet heştê sibehê heta dudu yê piştî nîvro, pêşwaziya nexweşan dike. Lê, di rojên kampanyayê de heta danê êvarê kar berdewam bû. Şêrîn Elî wiha domand: "Ji bo ku karmendên me yê jin, ji vê kampanyayê bê par nemînin, me ji bo wan seatên xwe yên kar zêde kirin. Lewra di danê sibehê de heta nîvro, jinên me yên ku di saziyan de kar dikin, nikarin serdana navendê bikin."

Rêvebira Nexweşxaneya Heyva Sor ya Kurdî û Navenda Mamografya Şêrîn Elî axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Pêwîst e hemû jin her 6 mahan carekê serdana navendê bike, ta ku keşfa Penceşêra Sîngê xwe çêke. Deriyê navendê her tim ji wan re vekirî ye. Lewra tendurustiya mirov ji her tiştî girîngtir e."



# `3 yemîn Festîvala Amara wê bibe serkeftina Şoreşa Çandî û Fikrî`

Bi dirûşmeya `Bi Pêşketina Şoreşa Çandî û Îdeolojî Werin Cenga Azadiyê` Tevgera Ciwanên Şoreşger ya herîma Efrînê, ji bo lidarxistina 3`yemîn Festîvala Amara li herêma Şehbayê amadekariyan dike.

Zana Roj/Şehba

Tevgera Ciwanên Şoreşger yên herêma Efrînê amadekaiya lidarxistina 3`yemîn Festîvala Amara dike. Ji bo pêşxistina Şoreşa çandî û fikirî û pêk anîna stratejiya Şerê gelê şoreşgerî yekemîn û duyemîn festîvala Amara hatine lidarxistin, bi wê armancê wê 3`yemîn Festîval jî were domandin.

Festîval wê di dîroka 27 ê cotmehê li navçeya Ehdas were destpêkirin û wê 4 rojan berdewam bike; 3 roj hunerî û filiklorî û roja dawiyê jî wê spor were pêşkêş kirin.




Têkildarî amadekariyên festîvala Amara hevserokê Desteya Ciwanan û Werzîşê û berpirsê Komîteya Amedekar Mihemed Wês ji me re axivî.

**`Armanca me geşkirina paradîgmeya Neteweya Demokratîk e`**

Mihemed diyar kir ku armanca ji vê festîvalê geşkirina rêngê paradîgmeya Neteweya Demokratîk e û wiha got: "Armanca me ji lidarxistina festîvaleke bi vî awayî, ew e ku em gelê herêmê bi her du pêkhateyên xwe Kurd û Ereb ji hev du nêz bikin, bi riya cudabûn û zengînbûna filiklor û huner re rengê paradîgmeya Neteweya Demokratîk bidin geşkirin"

**Çima Amara ?**

Mihemed balkişand ser sedema hilbijartina navê (Amara) ji bo festîvalê û wiha dirêjî da axaftina xwe : "festîvala li ser esasê paradîgmaya Netewa Demokratîk û felsefeya Rêber Ocalan hatiye birêxstinkirin, Amara jêdara ku mêrxwaz û feylesofê demê jê derketiye, Rêber Apo ji bo tevahî gelên bindest û ji bo biserxistina doza azadiya Kurdistanê, di girtîgeha Îmraliyê de têkoşîna herî mezin dide meşandin, li ser vê bingehê me ev nav hilbijart".

**3`yemîn Festîvala Amara li ser asta Bakur û Rojhilatê Suriyê tê amede kirin**

Mihemed têkildarî çalakiyên ku wê di 3 yemîn festîvala Amara de werin kirin,wiha got: "Amara 1`emîn li ser asta kantona Şehbayê bû, Amara 2`yemîn li ser asta kantona Efrînê hat çêkirin ,3`yemîn festîvala Amara wê li ser asta Bakur û Rojhilatê Suriyê bê lidarxistin, wê guhartin û rengên balkêş tê de werin dîtin, her wiha giropên ji derveyî herêmê jî wê beşdar bibin, wek giropa stranên Erebî ji Reqa û giropa guvendê a Çerkes



wê tevlî festîvalê bibin, di heman demê de wê giropên guvend, stran, şano, helbest ji her du pêkhateyan festîvalê bixemilînin".

**Armanca ji roja soprê**

Hevserokê Desteya Ciwanan û Werzîşê û berpirsê Komîteya Amedekar Mihemed Wês da zanîn ku spor û ciwan bingeha civaka ne û axaftina xwe wiha qedand: "Ji ber ku spor û ciwan bingeha civakan e û yên herî zêde ji aliyê kapîtalîzmê ve tên hedefgirtin, li ser vê esasê ji bo em bikaribin exlaqê sporê ya rast derxînin pêş û bi hemû pêkhateyan bi çanda Netewa Demokratîk ve bidin girêdan, me roja dawî ji festîvalê wekî roja sporê nîşan kir ".

# Stûna tifaqê Mam Zekî

**Di nav civaka Êzîdî de ji bo Mam Zekî tê gotin: Ew stûna tifaqa me bû. Nivîskar Mehmet Ozcan bi pirtûka xwe "Hevrêyê rojê Mam Zekî Şengalî", behsa jiyan û têkoşîna Mam Zekî Şengalî dike. Malbat û hevrêyên wî jî bi serpêhatiyên xwe yên li gel wî, wî bi bîr tînin.**

**Di nav civaka Êzîdî de ji bo Mam Zekî tê gotin: Ew stûna tifaqa me bû.**

Bi rastî jî dema mirov li helwêstên wî û her wiha tiştên ku ji bo miletê Kurd kirî, difikire, mirov baş tê derdixe ku ew jidil jî stûneke qewî ya miletê xwe bûye. Nexasim jî sekna wî ya li hember DAIŞ'ê nehişt ku fermana 73'an li hember Êzîdiyan biçe serî. Heger vê pêla dawî, ferman li ser serê Êzîdiyan ranebûbe, rola Mam Zekî di vê yekê de gelek e.


Nivîskar Mehmet Ozcan derbarê Mam Zekî de pirtûka bi navê "Hevrêyê rojê Mam Zekî Şengalî" nivîsî. Pirtûk behsa jiyana wî ya şoreşgerî dike. Her wiha Sozdar Avesta jî ji bo pirtûkê pêşgotinek nivîsandiye. Sozdar Avesta di pêşgotina ji bo pirtûkê de giringiya dîrokê bi bîr dixe û vê pirsê dike: "Çima em pêdivî pê dibînin ku hay ji dîroka xwe hebin?" Di dewamê de jî giringiya pirtûkê dide zanîn û pirtûkê wiha dinirxîne, "Ev pirtûk behsa têkoşîna hevrêyê me Mam Zekî Şengalî dike. Hûn ê vê pirtûkê di derbekê de bixwînin." Ev gotin, gotineke pirr rast e, ji lewma min jî dema rahişt pirtûkê, ez jê têr nebûm û min di derbekê de xwend.

**Mamê Êzîdxanê**

Sozdar Avesta di dirêjiya pêşgotina xwe de hevrêyê xwe Mam Zekî Şengalî bi hêz û kelecan bi bîr tîne û tîne ziman ku Mam Zekî Şengalî jî bi heman hêz û berxwedanê ji bo azadiya civaka Kurd li ber xwe da û şer kir. Sozdar Avesta wiha behsa Mam Zekî Şengalî dike: "Ew heta hetayê ji bo Êzîdxanê xebitî û weke 'mam'ê vê civakê ma di bîra me de. Pirtûk tenê behsa jiyana Mam Zekî nake, di heman demê de çand û baweriya civakên qedîm ên Mezopotamyayê jî tîne ziman." Dema mirov li van gotinan dihizire mirov dibîne ku îro bi rastî jî Mam Zekî bûye mamê Êzîdxanê û tevahiya civaka Êzîdî.

**Xiyanet, komplo û şehîdkirina Mam Zekî**

Nivîskar Mehmet Ozcan pirtûka "Hevrêyê Rojê Mam Zekî Şengalî" kiriye heft beş. Destpêkê bi awayekî kronolojîk behsa fermanan dike, ew fermanên li ser serê Êzidiyan hatine rakirin. Ew gotina xwe heta bi fermana dawî tîne. Piştî ku serpêhatî û qewimînên derbarê Êzîdiyan de bi dawî dibin, vêca behsa jiyana Mam Zekî Şengalî dike. Zarokatiya wî, naskirina wî ya PKK'ê û herî dawî jî tevlibûna wî ya nava refên şoreşê dike. Ew her wiha behsa xebatên wî yên li Ewrûpayê jî dike. Lê beşa herî bandorker, şehîdkirina Mam Zekî




Şengalî ye. Pirtûk behsa xiyanet û komployê jî dike. Mehmet Ozcan, bi vê xiyanet û komployê, şirove kiriye ka çawa DAIŞ´ê xwest fermana 73'yan bibe serî.

**Malbat û hevrêyên wî behsa wî dikin**

Ji xeynî van, Mehmet Ozcan di pirtûkê de cih daye gotinên hevrêyên Mam Zekî û malbata wî jî. Di pirtûkê de hevjîna wî Gulê, xwarziyê wî Hesen Ozden, xwîşka wî Xezal, keça wî Leyla Ozden, kurê wî Iskender Ozden û birayê wî Birahîm behsa serpêhatiyên xwe yên pê re dikin. Her wiha Cemîl Bayik, Sozdar Avesta, Beşîr Basî, Salihê Cizîrî (bi xwe jî şehîd bû), Omer Salih, Hesen Seîd Hesen (ew jî şehîd bû) û endamên HPG'ê Serxwebûn Azada, Xerbo Xidir, Pelda Çiya, Berfê Ilyas, Pîroz Nûda û Xanê jî Mam Zekî Şengalî bi bîr tînin û behsa wî dikin.

Pirtûka "Hevreyê Rojê Mam Zekî Şengalî" bi Kurmancî hatiye nivîsandin û di dawiya pirtûkê de hin wêneyên Mam Zekî Şengalî jî li pirtûkê hatine zêdekirin.- ***Ozgurpolitika***

# Aloziya Xazê berdewame û hê çareserî jê nehatiye dîtin

Aloziya Xazê hê berdewame û rojane welatî zehmetiyan di peydekirina xazê de dikşînin. Li milekî din jî bihayê Cereyê Xazê bilind bûye.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Peydekirina xazê ji bo her malbatekê bûye pirsgirêkeke cidî. Her kes dema ku xaza wî/wê di malê de namîne, dikeve tengayiyê. Kirîna xazê ji deverên cuda jî pir biha ye û hin caran jî peyda nabe. Niha cereya Xazê(10 litre) ji 3 hezar bûye 7 hezar. Lê pirsgirêka mezin ew e ku bi hêsanî nayê peydakirin. Derbarê pirsgirêka Xazê li kantona Qamişlo û zehmetiyên peydekirina wê, herwiha bihabûna cereya xazê, şêniyên bajar û rêveberê Beşê Xazê ya Kantona Qamişlo nêrînên xwe ji me re anîn ziman.

**`Nebûna xazê pirsgirêkeke cidî ye`**

Welatiyê bi navê Ebdullah Hisên yê ji taxa El Zihûr ya bajarê Qamişlo da zanîn ku pirsgirêka Xazê pirsgirêkeke cidî ye û axaftina xwe wiha domand: “Peydekirna cereyê xazê pir zehmet bûye û Cereyê wê jî têra mehekê nake. Lewra xaz, ji bo gelek tiştan tê bikaranîn. Heyva ku em cereyê xazê bi baldarî bi kar tînin, 20 rojan têra me dike. Ji bo wê jî divê her 20 rojan carekê ji bo her malbatê cereyek were dayîn. Bi taybetî malbata ku jimara wan zêde be. Çimkî di malê de, xaz pir tê bikaranîn û madeyeke sereke ye. Eger xaza me nebe, em nikarin xwarina xwe amade bikin. Bi taybet di dema zivistanê de pêwîstiya me bixazê pir heye.” Ebdullah ji bo bilindbûna bihayê cereyê xazê jî wiha got: “Bilindbûna bihayê cereyê ji bo me ne pirsgirêkek mezin e. Lê, pirsgirêka mezin ew e ku peyda nabe. Berî niha xaz peyda dibû, lê demek e peyda nabe. Em bang li berpirsên sotemeniyê dikin ku li ser vê mijarê bisekinin û çareseriyeke lezgîn jê re bê dîtin. Çimkî birsgirêka me ne xaz tenê ye.”

**`Em neçarin paporê bikar bînin`**

Ebdullah Hisên bîr xist ku ew gelek caran papora gazê jî bi kar tînin û ev yek li axaftina xwe zêde kir: “Ji ber ku cereyê xazê têra me nake em neçar dimînin paorê jî ji bo gelek xwarinan bi kar bînin. Tevî ku bikaranîna paporê xetere jî, lê em bi kar tînin. Da ku cereyê Xazê heta dawiya heyvê têra me bike.”

Ebdulla Hisên di dawiya axaftina xwe de got, em bihêvîne Rêveberiya Xweser çareseriyek ji vê pirsgirêkê re bibîne û barê me welatiyan kêm bike. Lewra xaz di her malbatê de madeyeke sereke ye.





**`Divê kesên ku xazê bi bihayên bilind difroşin bên cezakirin`**

Welatiya bi navê Esmaa Hesen jî diyar kir ku bihabûna cereya Xazê barê wan girantir dike û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Bihayê niha du qat ji nirxê berê ye û nayê peydekirin jî. Em her du mehan carekê cereyekê Xaz werdigirin. Pêwîste her mehê carekê be, lê her carê dereng dikeve. Ji bo wê jî wergirtina wê bi ser heyvekê dikeve.”

Esma bal kişand ser firotina xazê li hin deverên teybet û axaftina xwe wiha qedand: “Cereyê xazê li gelek deverên taybet peyda dibe, lê ew jî bi bihayekî pir bilind tê firotin. Hin jê bi 35 hina jî bi 40 hezarî difroşin. Lê em nikarin xazê bi vî bihayî bikirin. Lewra pir bihaye û aboriya me têrê nakê. Herwiha got, divê kesên ku xazê bi bihayên bilind difroşin bên cezakirin û rê li pêşiya wan were girtin.”

**`Jimara cereyên xazê têra tevayiya malbatan nake`**


Rêveberê Beşê xazê li bajarê Qamişlo Qasim Xelef sedema derengmayîn kêmbûna xazê ya vê dawiyê de derketiye holê da xuyakirin û wiha got: “Ji ber ku zext li ser kargeha Xazê heye nêzî du hefte ne me gaz ji kargehê wernegirtiye. Ev jî dibe sedem ku belavkirina xazê dereng bikeve.” Qasim derbarê kêmbûna xazê jî wiha got: “Rêjeya xazê ya ku ji Qamişlo û gundewarên derdora wê re hatiye veqetandin 44 hezar cere ye. Lê ev jimar bi temamî nagihêje me, lewra hin caran kargeh pirsgirêkên teknîkî tê de çêdibin, ji ber wê jî berhemê xazê nayê derxistin û kargeh tê sekinandin. Di rewşên wisa de xaz kêm tê derxistin û dibe ku welatî demekê bê xaz bimînin. Herwiha got, her heyvê kargeh nêzî 35 hezar cereyê xazê dide me. Ev jimar jî têra malbatên kantona Qamişlo nake. Lewra nêzî 75 hezar kartên xazê li gel me hene. Ji bo wê jî, em neçarin li nîvê malbatan belav bikin û nîvê din jî, di pêla duyem de li wan tê belavkirin. Bi vî awayî her 45 rojan xaz dighêje her malbatê. Raste ev yek zehmetiyan ji malbatan re çêdike, lê em neçarin bi vî awayî belav bikin, da ku xaz bighêje tevayiya malbatan.”



Qasim bal kişand ser bilinbûna bihayê cereyê xazê û axaftina xwe wiha domand: “Ji ber ku nirxê pereyên Sûrî her ku diçe li hember dolar kêm dibe. Ji bo wê jî vê dawiyê bihayê cereyên xazê bû 7 hezar.”

**`Eger gel xwe tine aliyê gazindê tine bibîne, wê alozî kurtir bibe’**

Rêveberê beşê xazê li bajarê Qamişlo Qasim Xelef di dawiya axaftina xwe de got, Em bi her awayî hewl didin xazê ji welatiyan re peyda bikin, herwiha alozî û pirsgirêka gelê xwe çareser bikin. Ji bo wê jî em bihêvîne gelê me jî bi me re alîkar be, da ku em bi hev re vê aloziyê derbas bikin. Lê eger gel xwe weke aliyekî gazindê tenê bibîne, wê alozî kûrtir bibe.



## BÊ EXLAQ ME BI JEHRÊ DIKUJIN



Hafiz Ahmet Turhalli

Neyarekî me yê hov heye û di cîhanê de tu hovîtî nemaye ku dijî kurdan bikar neanî be.
Ev bi salane me dikujin, têr nabin û dixwazin me ji holê rabikin. Dewleta bê exlaq, li hember gelê me û zarokên me tu çek nemayîne ku bi kar neanîn. Ev dewlet hêzekê ji NATO‘yê ye û dewletên endamên wê hemû, qaşo desthelatên cîhanî ne. Lê, an alîkarên vî şerî ne, an jî bê deng dimînin. Divê were zanîn ku ev sosreta han, rureşîya cîhanê ye. Pêwiste tu Kurdek, vê wehşetê tu caran ji hişê xwe dernexîne! Ji ber ku welatê me wek xak û niştiman, stargeha wan ya dawiyêye. Ji ber wê jî ev sedsala dawiyê qirkirinên bê sînor li ser miletê me pêk tînin.

Li Dêrsimê û Helepça birîndar, ev felaketa han bi ser mede anîn. Em îro jî dibînin li hember Egîd û Qehremanên Kurdan, çêkên bi jehrî bîkar tînin. Li gor agahiyên piştrastkirî, dewleta hov îsal bi hezarê caran ev çek bikar anîne. Bi frokeyan, topan û bi teqemenîyan vê hovitiyê didomîne. Desthilatdarên îro qaşo li ser cîhanê desthelatiyê dikin jî, wek dewleta tirk bê exlaq û bê pîvanin. Bi xwe zagon çêkirine û têde nivisîne, bikaranîna çekên bi jehrî qedexe ne. Lê ji hevalbenda xwe yê NATO‘yê re jî çekên kîmyewî û bi jehrî amade dikin û radestî wê dikin.
Divê bê guftugo, Kurd li dij van sosretan, xwe bikin yek deng û yek hêz. Kesê li dijî vê felaketê nesekine, divê nebêje ez Kurdim û behsa Kurdistana pîroz neke!
Lewre, îro Kurdekî dengê xwe dernexîne, dij vê sosretê nesekine, ewê kengê dengê xwe derxîne! Kesê/Kesa ev dîmen temaşe kiribe û rehet li mala xwe bixwe, vexwe û raze, bira behsa Kurdbunê neke.
Kesên ji xwe re dibêjin, em Misilmanin û di nav vê hovitiyê de behsa Îslamê bikin, bila bizanibin ku Îslam ji wan bêrî ye.
Lewre Îslam dijberiya zilmê û hovitiyê, li ser me Misilmanan ferz kiriye.
Çi bi serê we hatiye, win çima di rêya xwedê de, ji bo wan kesên ku bindestin, fîxan dikin, dibêjin Xwedawo, ji mer ji hêla xwe ve alîkaran bişîne, me ji vê bajarê ku desthelatdarên wan zalim û zordarin derîne, şer nakin‘. Nîsa 75.

Ev çekên Jehrî ku NATO dide vê dewleta qirker û dagirker, ew jî li dijî me kurdan, bê tirs û fikar bikar tîne. Desthelatdarên we, çekên jehrî, ji dewletên ku hûn dibêjin, ‘kafirin‘ digrin û pê zarokên me dikujin.

Gelî Misilman yê rast û dirust! destê Kurdan bigrin, milê xwe bidin milê Kurdan, ji ber ku îro li dijî Kurdan wehşetekê dijwar heye. Azadiya Kurdan xelasiya Ola Îslamêye û xelasiya Misilmanên dirust e. Divê, dijî van minafiq û qirkeran tekoşîna heqîqetê were bilind kirin. Pêxember silavên Xwedê lêbin dibêje, eger we xirabiyek an zilmek dît, bi destê xwe sererast bikin; ger hêza we tûnebe wê bi zimanê xwe eşkere bikin, ger we ew jî nekarî, ji dilê xwe ji wan zaliman nefretê bikin.
Îro em bi jehrê tên kuştin, welatê me hatiye dagirkirin ,zilma ku li me tê kirin erd û asîman tijî kiriye, êdî bese! Pêwiste em li dijî dewleta Tirk biserkevin û tola xwe helînin.



# Karasû: PDK`ê sûcên dagirkeriya Tirkiyê dinixumîne

Endamê Konseya Rêveber a KCK’ê Mûstafa Karasû bang li gelê Kurd kir ku li hemberî êrîşên kîmyewî rabin û got, şerma herî mezin a dîrokî ye ji bo PDK’ê ku bikaranîna gazên bi jehrî û çekên kîmyewî dinixumîne.

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

Endamê Konseya Rêveber a KCK’ê Mûstafa Karasû tevlî bernameya taybet ya televîzyona Medya Haberê bû û li ser tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û êrişên kîmyawî yên dewleta Tirk ya dagirker nirxand.

Mûstafa Karasû diyar kir ku yekane polîtîkaya dewleta Tirk ya dagirker, tepisandina hişmendî, rêxistinî, armanc, hesret û têkoşîna vî gelî ye û got, dewleta tirk di vê çarçoveyê de Rêber Apo tecrîd dike. Mûstefa Karasû da zanîn ku Rêber Apo dibe ku ji aliyê fîzîkî ve tecrîdkirîbe, lê belê Rêberekî welê ye ku ti carî nikare bê tecrîdkirin. Mûstafa Karasû da xuyakirin ku Rêber Apo bi fikrên xwe ne tenê bandorê li gelê Kurd dike û got, Rêber Apo bandorê li gelên Rojhilata Navîn û tevahiya cîhanê dike. Herwiha diyar kir ku gelên Rojhilata Navîn ji fikrên gelê Kurd hêz digirin û wiha domand: “Gelên cîhanê giştî ji fikrên Rêber Apo hêz digirin û Rêber Apo yekane rêberê niha ye ku çareseriyê ji pirsgirêkên li cîhanê re peyda kiriye, pêşniyar kiriye.”

Karasû destnîşan kir ku nerazîbûna raya giştî ya li hemberî çekên kîmyewî girîng e û got, divê gelê Kurd rabe ser piyan û hêzên demokratîk nerazîbûnê nîşan bidin û li hember vê faşîzmê rabin.
Endamê Konseya Rêveber a KCK’ê Mûstafa Karasû bi tundî PDK`ê rexne kir ku li pêşiya heyetên ji bo lêkolînkirina êrîşên kîmyewî bû asteng û got, dewleta Tirk bêguman dijmin e, êrîş dike.

Ewropa jî berjewendiyên xwe hene, rastiyan ji neditî ve tê. Lê belê ya herî giran û bi êş PDK`ê ye. Van êrîşan dinixumîne. Pêşî li mirovan digire ku dixwazin biçin herêmên çeên kîmya hatîne bikaranîn. Lê ew sûcên Tirkiyeyê dinixumîne. Nixumandina sûcên Tiriyeyê ji PDK’ê re maye. Şerma herî mezin a dîrokî ye ji bo PDK’ê ku bikaranîna gazên bi jehrî û çekên kîmyewî dinixumîne.



# HPG: 5 dagîrker hatin cezakirin

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

**Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG’ê ragehand ku di çalakiyên hêzên wan de 5 leşkerên Tirk ên dagirker hatin cezakirin. Herwiha HPG`ê diyar kir ku dagirkeran 17 caran bi bombeyên qedexe û çekên kîmyewî êrîş kirin.**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG’ê bi daxuyaniyekê ragehand ku di çalakiyên gerîlayan de 5 leşkerên Tirk ên dagirker hatin cezakirin û got: “Di çalakiyên hêzên me de 5 dagirker hatine cezakirin, 3 dagirker birîndar bûne. Di heman demê de çeperek, radarek, mobeseyek û konekî leşkerî hate îmhakirin. Artêşa Tirk a dagirker Qadên Berxwedanê 17 caran bi bombeyên qedexe û çekên kîmyewî û bi dehan caran jî bi tankan bombe kiriye.”

HPG`ê da xuyakirin ku di 20’ê Cotmehê de dagirkeran dema ku xwestine li dora çeperên şer ên Şehîd Felat pergala kamerayê ya mobeseyê bi cih bikin, hêzên wan li dagirkeran dane û dagirkerek hate cezakirin û pergala kamerayê ya mobeseyê hate îmhakirin. Herwiha ragehand ku di 20’ê Cotmehê de li Qada Berxwedanê ya Çemçoyê tîmên wan yên gerok bi çekên giran 3 caran li dagirkeran dan û 4 dagirker hatine cezakirin û dagirkerek jî birîndar bûye.

HPG`ê da zanîn ku di 20’ê Cotmehê de tîmên wan yên gerok ên YJA Starê bi çekên giran li dagirkerên li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî dane û 2 dagirker birîndar kirine. HPG`ê da xuyakirin ku di 20’ê Cotmehê de çeperên şer ên Şehîd Felat a li Qada Berxwedanê ya Sîdayê 5 caran bi bombeyên qedexe û 5 caran jî bi çekên kîmyewî hatine bombekirin.



Herwiha çeperên şer ên Şehîd Yûnûs a Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî, çeperên şer ên Şehîd Xursî yên li Qada Berxwedanê ya Sacayê, çeperên şer ên Şehîd Agir ên li Qada Berxwedanê ya Sacayê û çeperên şer ên Şehîd Bahoz a li Qada Berxwedanê ya Çemçoyê bi bombeyên qedexe û çekên kîmyewî 7 caran hatine bombekirin.

# YPS’ê li wesayîta gardiyanan da

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

**Tîma Tolhildanê ya Şehîd Zelal Xerzan a YPS’ê li Amedê li wesayîta gardiyanan da.**

Tîma Tolhildanê ya Şehîd Zelal Xerzan a YPS’ê bi ndaxuyaniyekê ragehand ku wan li Taxa Alî Pinar a Şehîtlika Amedê li wesayîta gardiyanan da.

YPS’ê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku Tîma wan ya Tolhildanê ya Şehîd Zelal Xerzan a YPS’ê, di 17’ê Cotmehê de saet di 01.54’an de li Taxa Alî Pinar a Şehîtlika Amedê li otobusa bi plakaya 21 s 0580 a ku girtiyên siyasî ji Girtîgeha Tîpa F a Nimreya 1’emîn a Amedê dibir Girtîeha Tîpa F a Nimreya 2’an a Amedê, da.




YPS’ê da zanîn ku rejîm faşîst a AKP û MHP’ê li hemberî hemû kesên ji bo azadiyê li ber xwe didin, êrîşeke topyekûn daye destpêkirin û got: “Berxwedêrên di girtîgehan de ji mafên xwe yên heq û hiqûqê mehrûm hatine hiştin û êşkence li girtiyan tê kirin. Rejîma faşîst a AKP û MHP’ê ji bo ku girtî di girtîgehan de jiyana xwe ji dest bidin, şertên girtîgehê roj bi roj giran dike.”

YPS`ê da xuyakirin ku ev çalakî li dijî zext û êrîşên dermirovî yên li ser girtiyên siyasî hatiye kirin û got: “Em YPS û YPS-JIN diyar dikin wê çalakiyên me yên li hemberî êşkence û qetlîama ku rejîma AKP û MHP’ê bidome.”

# Dîmenên nû yên bikaranîna bombeyên qedexekirî

**Navenda Nûçeyan**

**Êrîşên dewleta Tirk a dagirker ên li ser Herêmên Parastinê yên Medyayê bi dîmenekî nû gihîşt ajansa ANFê, ku bikaranîna bombeyên qedexekirî nîşan dide.**

Dîmenên nû yên gihîştin ajansa ANFê, bi rengekî eşkere rastiya bombardûmana bi çekên kîmyewî ya bi rojan raxist pêş çavan.

Dîmen li Girê Şehîd Pîrdogan ê li Qada Berxwedanê ya Girê Amediyê ya Metînayê hatiye kişandin. Artêşa Tirk ji 4’ê Tîrmehê û vir ve hewl dide li vê qadê serwer bibe. Qada Berxwedanê ya Girê Amediyê ew cih e ku hêzên PDK’ê di 27’ê Tebaxê de rê çêkir û tevî artêşa Tirk êrîşî gerîla kir. Berxwedana gerîla jî hîn dewam dike. Dewleta Tirk û PDK ku dikin nakin nikarin berxwedana gerîla bişikînin, bi hev re li dijî gerîla bombeyên qedexekirî û çekên kîmyewî bi kar tînin.



# `Kesê bêdeng dimîne, şirîkê kuştina zarokên me ye`

Şêniyên bajarê Qamişlo sûcên dewleta tirkî ya dagîrker yên li herêmên parastina rewa şermezar kirin û bang li Civaka Navneteweyî û Rêxistinên Mafên Mirovan kirin ku nebin hevkarên kuştina zarokên wan in.

**Rojbîn Zagroz/Qamişlo**

Navenda Parastina Gel nasnameya 17 Gerîlayên azadiyê yên ku di encama êrîşa kîmawî ya dewleta tirkî ya dagirker de şehîd bûyîn, bi raya gîştî re eşkere kirin.
Derbarê bikaranîna Tirkiyê ji çekên kîmawî re û hedefgirtina qadên gerîlayên azadiyê, şêniyên bajarê Qamişlo ji me re axivîn û diyar kir ku kesê li hember sûc û kiryarên Tirkiyê bêdeng dimîne, şirîkê wê ye.

**‘Çareya binkeftina xwe bi karanîna çekên kîmawî de dibîne’**



Welatiya bi Hilwa Silêman da zanîn ku Dewleta tirkî ya dagîrker tevayiya cûre û rêbazên tundiyê, herwiha polîtîkayên tunekirinê li qadên parastina rewa pêk tîne û axaftina xwe wiha domand: “Tirkiyê pîvanên exlaqî û mirovî binpê dike. Armaca wê ew e ku gerîla têk bibe û wan ji holê rake. Lê berxwedana gerîla her carê Tirkî vala derdixe. Ji bo wê jî êrîşên xwe yên hovane zêdetir kiriye û berê xwe daye çekên kîmyawî.”

**`Eger ne ji hevkariya PDK`ê be Tirkiyê nikare tiştekî bike`**

Hilwa da zanîn ku hovîtiya ku Tirkiyê dike tev bi destê PDK`ê ye û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Eger ne ji hevkariya PDK`ê be Tirkiyê nikare tiştekî bike û nikare zarokên me hedef bigre. PDK`ê qadên gerîla nîşanî dagîrkeriya tirkî dike û rê dide wê ku çekên kîmawî bi kar bîne. PDK`ê ji xiyanetê têr nabe. Xuyaye ku ew dijminê xwe nas nakin. Lê bila baş zanibin ku xiyanet û hevkariya wan me naşkîne. Emê her hebin û emê xwe bikin xelekeke agir li derdora gerîlayên xwe.”

Hilwa Silêman di dawiya axaftina xwe de got, wek gelê bakur û rojhilatê Sûriyê emê piştgirên gerîlayên azadiyê bin, lewra gelîra ji bo her kesê bindest û di nav zilm û zorê de têdikoşe.

**`Kesê li hember kiryarên Tirkiyê bêdeng dimîne, şirîkê kuştina zarokên me ye`**



Welatiyê bi navê Ebdulhelîm Iko jî, bal kişand ser bêdengiya dewletên Navneteweyî û got, Dewletên Navneteweyî û mafê Mirovan li hember sûc û kiryarên Tirkiyê yên hovane bêdeng dimînin. Herwiha ev kes naxwazin gelê kurd bibin xwedî maf. Ji bo wê jî em dibêjin; ‘kesê li hember kiryarên Tirkiyê bêdeng dimîne, şirîkên kuştina zarokên me e’.”

**`Naxwazin projeya Netewa Demokratîk bi ser bikeve`**

Ebdulhelîm da xuyakirin ku tevayiya çekên kîmawî yên ku dewleta tirk li dijî gerîla bi kar tine, ji gel dewletên navneteweyî peyda dike û axaftina xwe wiha domand: “Dewletên navneteweyî piştgiriya Tirkiyê dikin û hewl didin bi riya Tirkiyê kurdan bê çare bihêlin. Ev dewlet naxwazin projeya Netewa demokratîk ya ku bi fikir û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan pêê ketî, bi ser bikeve. Ji bo wê jî alîkariyê didin Tirkan ku me tine bikin.”

Ebdilhelîm Iko di dawiyê de bang li Civaka Navneteweyî û Rêxistinên Mafên Mirovan kir ku nebin hevkarên kuştina zarokên wan.

# `Sînaryo ji aliyê MÎT`ê ve hatiye plankirin`

**Mihemed Xanim / Qamişlo**

**Remzî Şexmûs diyar kir ku kontrolkirina çeteyên Cebhet El- Nusra ji herêma Efrînê re şanoyeke bi destê MÎT a Tirkiyê hatiye amadekirin û got, armanca dewleta tirk ya dagirker temamkirina guhertina demografiya Efrînê ye.**

Di 11 Cotmehê li Efrîna dagirkirî de, di navbera çeteyên dewleta Tirk ya dagirker yên bi navê Cebhe Al Şamiyê û yên bi navê El Hemzat de şer derket. Çeteyên El Hemzat alîkarî ji çeteyên Tehrîr El-Şam (Cebhet El-Nusra ya berê) xwestin. Çeteyên Cebhet El -Nusra jî li ber çavên hêzên dagirkeriya Tirk, karwanên leşkerî ji Idlibê şandin û bajarê Efrînê û derdora wê bi temamî xistin bin kontrola xwe de. Derbarê kontrolkirina çeteyên Cebhet Al- Nusra herêma Efrîn û armanca dewleta tirk ya dagirker ji van planîn qirêj, endamê Navendiya Partiya Demokratîk ya Kurd ya Sûriyê Remzî Şêxmûs ji me re axivî.




Şexmûs diyar kir ku kontrolkirina komên çete yên bi navê Cebhet El-Nusra ji herêma Efrînê re, senaryoyeke ku bi destê MÎT a Tirkiyê hatiye amadekirin e û wiha got: “Pirs ew e, ka dewleta tirk ya dagirker çi dixwaze? Tu bûyer li herêmên dagirkirî, beyî fermana dewleta tirk ya dagirker pêk nayên. Ji ber ku yê herêm dagirkirî û kontrol kirî, ew e. Komên çekdar jî, di destê wê de amûr û kevirên şantranjê ne. Tirkiyê li gorî berjewendiyên xwe çawa dixwaze wan wisa bi kar tîne. Koma çeteyên bi navê Cebhet El- Nusra, tu cûdahiya wan ji çeteyên bi navê Hemzat û Emşat yên ku dizî, talanî û kumkujî li ser gelê Efrîn û herêmên dagirkirî pêk anîn , tune ye. Tevayiya van komên çete bi destê MÎT a Tirkiyê hatine avakirin.”

**‘Armanca dagirkeriya tirk avakirina kembereke reş ji çeteyan’**

Şêxmûs da xuyakirin ku yek ji armancên dewleta tirk ya dagirker ji radestkirina herêma Efrîn ji komên çete yên bi navê Cebhet El- Nusra, avakirina kembereke reş a ji komên çete û bikaranîna wan di êrişên li dijî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê ye û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Bicihkirina nû ya komên çete yên bi navê Cebhet Al- Nusra (Heyet Tehrîr El Şam) di çarçoveya planên dagirkeriya Tirk de, ji bo avakirina kembereke reş a ji komên çete li eniyên şer ji başûrê Efrînê bigire heta eniyên Minbic û rojavayê Kobanê, pêk tê. Da ku wan çeteyan di êrişên li dijî bakur û rojhilatê Sûriyê bikar bînin.”

**`Çete bûne kevirê şatrenjê`**

Şexmûs bal kişand ser girêdana danûstendinên di navbera hikumeta Şamê û dewleta tirk ya dagirker, bi kontrolkirina Cebhet Al- Nusra ji herêma Efrînê ya dagirkirî re û wiha got: “ Danûstendinên di navbera hikumeta Şamê û dewleta tirk ya dagirker de li ser asasê istixbaratan tê kirin, ev têkiliyên istixbaratî tu caran di navbera wan de qut nebû ye. Niha peymana Adana ya ku di sala 1998’an de hatiye imzekirin, bi şewazekî din ji nûve bixin dewrê. Geşedanên li herêmên dagirkirî di çarçoveya amadekarî û danûstandinên plankirî yên di navbera hikumeta Şamê û dagirkeriya Tirk de tê meşandin.  Tê xuyakirin ku bi zexta Rûsya wê li Idlibê radestî hikumeta Şamê û Rûsyayê bê kirin. Ji bo wê jî, divê çeteyên Tehrîr El Şam li Efrîn, Cerablus û Ezazê bin.”

Şexmûs da zanîn ku dewleta tirk ji bo ku karîbe xaka Sûriyê dagîr bike, hewil dide wê perçe bike û axaftina xwe wiha qedand: “Dagirkeriya tirk hewil dide ku plana xwe ya guhertina demografiya Efrînê û çewisandina nasnameya wê ya kurdî temam bike, herwiha van herêman veguherîne stragehên ewle yên serçeteyên rêxistinên terorist, mîna DAIŞ û El Nusrayê ne. Plana dewleta tirk ya dagirker, dagirkirina tevayiya Sûriyê û Iraqê ye û avakirina osmaniya nû ye.”



## Parastina Gerîla

**Farûk SAKIK**

Piştî ku di sala 2021’ê de êrişên dewleta Tirk a dagirker dest pê kirin, bikaranîna çekên kîmyevî ket rojevê. Bi sîstematîk û bi tenê çekên kîmyawî dihat bikaranîn. Artêşa Tirk berê jî bombeyên qedexe û çekên kîmyewî di cihên cûda de bi kar anibû. Lê, di salên 2021’ê û di 2022’yan de, ev êriş sîstematîk bûyîne.

Artêşa dagirker li hember berxwedan û lehengiya gerîla, her cûre çek bi kar anî. Lê, her çiqas çekên sûcê şer û mirovahiyê bi kar anî jî, dîsa bi ser neket.
Em ê hemû îstatîstîkên ji Dersimê heta Werxelê deynin aliyek. Lê, dîmenê şehadeta her du gerîla (Baz û Helbest) deynin berçavê xwe. Baz jehrî bûbû û diricifî, Helbest bêhiş bûbû. Her du jî piştî demekî kurt şehîd bûn. Hemû mirovahî ku ji şehadeta wan berpirsyar bûn, tenê dîmenên wan temaşe kirin.
Heger dîmen û agahiyên çekên kîmyewî yên ku me di sala 2021’an de dîtîn me midaxle bikira, dîmenên sala 2022’yan me ne dîtin. Yan jî, heger me midaxaleyê îstatîstîkên sala 2022’yan bikira, me yê dîmenên Baz û Helbestê temaşe nekira. Em hemû gunehbar in…
Me çi dikaribû bikin ku me nekir?
PKK’ê Şerê Gel ê Şoreşgerî dabû dest pê kirin. Navê şerê têkoşîna azadiya Kurdistanê, Şerê Gel ê Şoreşgerî bû. Diviya, em li gorî van dîrektîf(talîmat)’ên PKK’ê tevbigeriyana. Çima? Ji ber ku li Qendîlê PKK’ê ‘ocaxên madenan’ nînin û li wê derê ji bo berjewendiyên xwe şer nedikirin. PKK ji bo azadiya Kurdistan şer dikir. Cemîl Bayik, Duran Kalkan, Mustafa Karasu û hevalên xwe, bi tercûbe û zanyariyên xwe yên bi salan; di vê pêvajoyê Rêber Apo di tecrîda giran de, rê li pêşiya civaka kurdan vedikirin. Daxuyanî û daxwazên wan, me yek bi yek bi cîh anîba ne, dibe ku ewqas gerîla şehîd neba ne.
Diviya me di vî şerî de ew bi tenê nehiştina û Em jî tevli nav Şerê Gel ê Şoreşgerî bibûna. Di vî şerî de ne şerte ku mirov çek bigire dest xwe. Ev şere; kî li ku derê çi dikare bike, berpirsyariya xwe bizanibe û erka xwe bi cîh anîn e. Şer û têkoşîn yek in. Gerîla şer dike, divê tû jî tiştek din bikeyî.
Baş e piştî ku ev çekên kîmyewî li dijî kurdan hatin bikaranîn, kurdên ku bê çek bûn dikaribûn çibikin? Dikaribûn, nerazîbûn nîşan bidana û zext li ser hikûmetên herêma xwe bikira, da ku wan jî siyaseta xwe li gorî wan daxwazan dîzayn kiriban e.
Kurdên li Ewrûpa û dostên xwe, dikarîn li ber saziyên berpirsyar, çalakiyên demokratîk li dar bixin, da ku ev sazî erk û misyona xwe bi cîh bînin.
Artêşa Tirk, di sala 2021’ê de 367 caran bombeyên qedexe û êrişên bi çekên kîmyewî pêk anîn û di van êrişan de, 46 gerîla şehîd bûn. Ji 14’ê Nîsana 2022’yan heta 14’ê Cotmehê, 2 hezar û 467 caran bombeyên qedexe û çekên kîmyewî hatine bikaranîn. Di van êrîşan de 27 gerîla şehîd bûn e. Herî dawî 17 fermandar û şervanên Kurdistanê, bi heman çekan hatine şehîdxistin.
Wek di îstatîstîkan de jî diyar e ku hejmara bikaranîna çekên kîmyevî di 2022’an de zêde bûye. Raste  gerîla bi rêbaz û hamleyên bi tercûbe lê dide. Li dewsa gerîla tû artêşên dewletan nikarin di tunelên şer de, rojekê jî li ber xwe bidin. Lê, divê herkes tevli Şerê Gel ê Şoreşgerî bibe ku pêşî li şehadetan bê girtin, êdî şehadeta yek gerîla jî zêde ye…



# `PDK berpirsê yekê yê êrişên kîmyawî yên ser qadên gerîla ye`

Emîn Elîko diyar kir ku hêzên navnetewyî, hikumeta Iraqê û PDK`ê berpirsên êrişên kîmyawî ne û wê hisab ji wan bê xwestin. Herwiha bang li mirovên azadîxwaz kir ku li hemberî sûcên dijmirovî bêdeng nemînin.

**Şaho Gabar / Qamişlo**

Dewleta Tirk ya dagirker di 14’ê Nîsana 2022’yan de li hemberî gerîlayên PKK’ê li Zap, Metîna û Avaşînê dest bi êrişeke nû ya qirkirinê kir. Gerîlayên azadiyê jî bi vîn û baweriyeke mezin li hemberî dagirkeriya dewleta Tirk, berxwedaneke dîrokî dimeşînin. Artêşa Tirk, ruxmê ku teknîka herî pêşketî a cîhanê li hemberî gerîla bikar tîne jî, nikare îradeya gerîlayan bişikîne. Berevajî armancên xwe, artêşa Tirk li hember



berxwedana gerîla, li ber têkçûnê ye. Dewleta Tirk ya dagirker ji bo rê li ber vê têkçûnê bigire, li gel teknîka bilind her cûre çekên qedexekirî û çekên kimyewî bikar tîne. Li gor encamên şer ku Navenda Parastina Gel (HPG)’ê ragihandiye raya giştî, dewleta Tirk di nav van 6 mehan de 2 hezar û 500 caran bi çekên kimyewî êrişê hêzên gerîla kiriye. Bi taybet di demên dawî de êdî rojane çekên kimyewî bi kar tîne û tenê di 2 mehên dawî de 17 gerîlayên azadiyê bi van çekan şehîd bûn.
Derbarê êrişên kîmyawî yên dewleta Tirk ya dagirker yên li dijî qadên gerîla, endamê Meclisa Giştî ya Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) Emîn Elîko ji me re axivî.

**‘Bi karanîna çekên Kîmyawî îflasa dewleta Tirk e’**

Emîn diyar kir ku zêdebûna bikaranîna çekên kîmyawî li dijî qadên gerîla, iflaskirina dewleta tirk ya dagirker eşkere dike û wiha got: “Dema hikumeta AKP`ê dixwaze ji kirîzên hundirê Tirkiyê bireve, êrişên xwe yên ser qadên gerîla û bakur û rojhilatê Sûriyê zêde dike. Ev ne cara yekê ku dewleta Tirk ya dagirker li dijî qadên gerîla çekên kîmyawî bikar tîne, lê civaka nevnetewî xwe ker û lal dike. Her ku dewleta Tirk li qadên gerîla bi bin dikeve û hêza wê têk diçe, çekên qedexekirî mîna fosfor û kîmyewî bi kar tîne. Siyaseta qirkirina gelê kurd bênavber dimeşîne. Bikaranîna çekên giran; balafirên şer, bêmirov û tevahî çekên qedexekirî ne ji valahiyê tên, ew encama hilweşîna hêza wê ye ku li hember berxwedana gerîlayên leheng ku dorpêçkirî ne, pêk tên.”

**`Civaka Navneteyî, Iraq û hikumeta başûr hevkarên bikaranîna kîmyawî ne`**

Emîn da xuyakirin ku bêdengiya hêzên navneteweyî ya li hember sûcên dewleta Tirk Ya dagirker hevkariya wan ya bi van sûcan re eşkere dike û wiha got: “Bêdengiya hêzên navnetewyî li hemberî bikaranîna çekên kîmyawî tê wateya pejirandina bikaranîna van çekan. Herwiha bêdengî, tekez dike ku berjewendiyên hevbeş di navbera wan de hene. Êrişên Kîmyawî yên dewleta tirk ya dagirker, bandoreke pir xerab li ser hemû zîndiyan dike, berpirsê wê jî ne tenê dewleta tirk ya dagirker e, civaka navnetewî, hikumeta Iraqê û hikumeta Başûrê Kurdisatanê jî, bi bêdengiya xwe hevkarên sûcên dijmirovî ne.”

**`Berpirsê yekê ji êrişên kîmyawî re PDK`ê ye`**

Emîn balkişand ser xiyaneta PDK`ê û wiha got: “Dewleta Tirk ya dagirker bi tenê nikare derbasî qadên gerîla bibe û şer bike, ji bo vê pêwîstiya wê bi xayînan heye. Mixabin xayînê navdêrê dîroka gelê Kurd jî  PDK`ê ye. PDK`ê bi tevaiya hêza xwe destek da dewleta tirk ya dagirker û ew bi xwe jî kete nava şerê li dijî gerîla de. Ji salî 90 heta niha PDK`ê li dijî îradeya gelê kurd tevdigere û ji dijmin re dibe rê. Tişta ku dijmin nikare bike ew dike. Herî dawî maskeyên ku ji bo bêbandorkirina çekên kîmyawî ji gerîla re hatibûn, dest danî ser.  Rê ji dewleta tirk ya dagirker re vekir, kemîn danî pêşiya gerîla û gerîla şehîd xistin. Herwiha astengî ji rêxistina IPPNW ya şopandnê re derxist, da ku rastiya bikaranîna kîmawî eşker nebe. Wê xiyaneta PDK`ê tu carî neyê ji bîrkirin û gelê kurd wê hisab jê bixwaze, di demeke nêz de wê hisabekê mezin bide.”



**`Berxwedana gerîla Rûmeta me parastiye`**

Endamê Meclisa Giştî ya Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) Emîn Elîko da xuyakirin ku Gerîla rûmeta mirovayiyê parastiye û axaftina xwe wiha qedand:”Gerîlayên azadiyê rûmeta mirovaiyê parastiye, divê kesên hiqûqî û rewşenbîr li asta Rojhilata Navîn û cîhanê dengê xwe li hemberî sûcên dijmirovî yê dewleta tirk ya dagîrker bilind bikin. Herwiha divê gelê Kurd li welat û derveyî welat dakeve qadan û dengê xwe bilind bike. Dewleta tirk û hevalbendên wê şerê qirkirina gelê kurd  û tevayiya gelên azadîxwaz birêve dibin.”

Hêjayî gotinê ku şandeya IPPNW’ê di 20-27’ê Îlona borî de serdana Başûrê Kurdistanê kiribû û ragihand  ku wê gelek delîl li ser bikaranîna çekên kîmyewî ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve bi dest xistine. Her wiha şandeyê diyar kir ku Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) xebatên lêpirsînê û hevdîtina bi mexdûrên êrişên kîmyewî re, asteng kirin.

# `Li hember planên qirêj berxwedan û xwedîderketina li têkoşînê pêwîst e`

**Bêrîtan Çiya-Hesekê**

**Têkildarê êrişên dewleta tirk ya dagîrker yên li ser Rojava, Mihemed Haco diyar kir ku, dewleta tirk ji bo destkeftiyên Şoreşa Rojava têk bibe, bi rejima Sûriyê re, hevdîtina pêk tîne. Herwiha Mihemed got, dewleta tirk ji sîstema projeya demokrat, ditirse. Lewra roj bi roj êrişê xwe zêde dike.**

Bi armanca têkbirina projeya demokratîk û guhertina demografiya herêmê, dewleta tirk ya dagîrker û çeteyên wê rojane gundên bakur û rojhilatê Sûriyê, bi çekên giran topbaran dike. Di encama topbarana de ziyanên herî mezin digihîn mal, milk û canê welatiyan. Dewleta tirk bi êrişên xwe yê hov dixwaze gelê herêmê koçber bike û Kurdistanê giş dagir bike.

**`Armanc gelê herêmê gişti ye ne tenê gelê Kurd e`**

Li ser mijarê Endamê Komîta Koçberên Serê Kaniyê Mihemed Haco ji rojnameya me re wiha axivî: “Dewleta tirk ya dagîrker û çeteyên wê hema bêje rojane gundên bakur û rojhilatê Sûriyê topbaran dikin. Herwiha kesayetên xwedîcih jî di riya MÎT’ên xwe ve dike armana xwe. Dewleta tirk êrişî tevayîya gelê herêmê yê aşîtîxwez û bi rûmet dike. Îro bi saya xwîna şehîdan û projeya Netewa Demokrat, gelê herêmê bi aramî jiyan dike, herwiha destkeftiyên herî mezin bi saya xwîna zarokên xwe, bi dest xistine.”

Haco got, dewleta tirk ji destpêka Şorşa rojava ve êriş dike, herwiha bi rêxistinkirina çeteyên mîna DAIŞ`ê bajarê Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî dagîr kir û kiryarên herî hov, li wan bajaran pêk tîne. Jixwe li hember van êriş û kiryaran, dewletên navneteweyî jî heta niha bêdeng in.

**`Li keda parasvanên jiyana xwe xwedî derkevin`**

Mihemed axaftina xwe wiha domand: “Rêveberiya Xweser tevî hemû êriş û derfetên kêm, karî rewşeke aram li herêmê bide çêkirin. Herwiha Rêveberiyê bi hezaran koçber pêşwazî kiriye. Dewleta tirk ya dagîrker bi êrişên xwe, dixwaze vê aramiyê têk bibe û rêveberiyê reş bike. Lewra ew dewleteke desthilatdar e û azadiya gel ji bo wê ne girîng e.”

Mihemed li ser hevdîtinên dewleta tirk û rejîma Sûriyê wiha got: “Dewleta tirk di salên borî de rejîma Sûriyê Beşar El-Esed miroveke sûcdar pênase dikir û digot, ‘em hevdîtinan bi rejîma Sûriyê re çênakin’. Niha ji bo qirkirina gelê herêmê bi taybetî gelê Kurd, dixwaze bi Esad re hevdîtin pêk bîne. Li hember van planan, divê gelê me hişyar be. Divê têkoşîn û berxwedana xwe xurttir bikin. Lewre yê ku mafê me diparêze û wê biparêze, pirojeya Netewa Demokrat e.”



Endamê Komîta Koçberên Serê Kaniyê Mihemed Haco axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Eger em di van demê dawî bi berxwedan, vîn û baweriya xwe danekevin qadan û gotina xwe nekine yek, emê nikaribin destkeftiyên xwe yê bi xwîna şehîdan hatine bi dest xistin, biparêzin.”



## “Civîna Aliman” Li Amedê

**Ahmed Aktaş**

Li alîkî civîna Aliman li Amedê pêktê, li aliyê din li Kurdistanê gelê me, di bin êrîşên qirkirinê yên dewleta tirk de ye.
Bê şerm û fedî, di civînê de behsa “parastina” Kurdistanê dikin.
Weke ku ev civîn, ne li bajarekî Kurdistanê yê di bin dagirkeriya dewleta Tirk de pêktê!
Li dewletek wisa civiyane ku, êdî ne bi tenê çekên konvansiyonel û froke, nuha çekên kîmyewî  jî pir tên bi karanîn.
Her wiha ne bi tenê  hinek kesan; jin, mêr, zaro, pîr, çekdar, sivil, hema hemû civak, belê li gel mirovan, xwezaya Kurdistanê jî daye ber qirkirinê.
Ka em bala xwe bidin beşdarên civînê. Jixwe civînek taybet e û xwedî armancek giring e. Ji her çar parçeyên Kurdistanê û nûnerê Efxanîstanê beşdar bûne:
Ji Efxanistanê berdevkê Rêveberiyê Zahîbullah Mucahid. Ji Rojava Şêx Zahid El Xeznewî. Ji Hewlêrê nûnerê Yekîtiya Alimên Cîhanê Pro.Dr.Ehmed Abdulwehab Pencewînî li gel çar kesên din. Ji Bakur Zekeriye Yapicioglu yê serokê Huda Par(a ku navê xwe yê erebî Hizbullah guheriye kurdî).
Dibe ku mijara herî balkêş a armanca vê civînê dide nîşandan ev be: Kesê ev civîn vekiriye û bêgûman bi navê R.T.Erdogan tevgêr kiriye û birêve biriye; Serokê Yekîtiya Aliman û Medreseyan Mele Enver Kiliçaslan e! Ev kes, tawanbarê kuştina 42 kesan û Izettin Yildirim ê serokê Weqfa Zehra Med û Konca Kuriş a femînîsta îslamiye.
Her wiha, vî gunehkarî, bi serokê Hizbulahê Huseyin Velioglu re gelek hevaltî kiriye û bi hevre çûne Îranê, li bajarê Kûmê perwerde jî dîtine û hwd.
Îca, gelo civînek ji kesên wisa pêk hatibe, dikare hêviyek baş/pozitif jê bibe? Her wiha, ev civîn, him li Amedê û him jî di demek wisa de ku êrîşên qirker ên dewleta tirk, di asta herî dijwar de û bi çekên kimyewî, bi taybetî li ser Tevgêra Azadiya Kurdistanê û bi giştî li dijî hemû gel û xaka pîroz a Kurdistanê tê meşandin?
Gelo, di navbera zîhniyeta bi giştî li dijî mirovahiyê û bi taybetî li dijî jina azadîxwaz, ku li Efxanistanê, li Îranê, li Rojava(li Efrînê, Serêkaniyê, Girêspî û hwd), li Başûr(li Şingalê, li Mexmûrê  û hwd.), çi bi navê Talîban an DAIŞ, HTŞ, El Nusra û hwd.tê meşandin de û zihniyeta qirker û dagirker a R.Erdogan tu cudahî heye?
Diyar dibe ku armanca bingehîn a vê civîna 7an a ALIMAN(Ittihadul Ulema) a Amedê, avakirina eniyek bi navê ola (sunî)îslamî li dijî Tevgêra Azadiya Kurdistanê ye.
Wisa diyar e ku li ASTANA, ev plan hatiye pejirandin. Hewldana valakirina Idlibê û guherîna çeteyên Efrînê, nîşanek e.
Her wiha avakirina rêveberiya nuh a li Bexdayê jî nîşaneya dudaye.
Dibe ku, hêzên hegemonên sereke jî li ser vê planê pêkhatibîn.
Ev plan, ne li goreyî dilê Îranê ye. Jixwe nîşanê vêna di pêkhatina Bexdayê de tê dîtin; hêzên alîgirên Îranê beşdarî rêveberiya nuh nabin. Her wiha nakokiyek din a giring jî cudahiya mezhebî ye. Heman nerazîbûn li Idlibê û hemû Suriyeyê jî tê xuyakirin.
Bêgûman xeter ne biçûke, lê weke hercar tê gotin, derfet jî ne biçûke!